



Sûnetkirina keçan li Herêma Kurdistanê, 19 sibat 2010

Sûnetkirina keçan li Herêma Kurdistanê

Hewildanên ji bo parastina mafê jinan li Herêma Kurdistanê hene, rojbiroj bihêz dibin. Li ser pirsê çalakî dibin û jin organîze dibin. Helwesta beşek ji rêvebirên herêmê li ser pirsê êrênî ye. Ev tev îşaretên pêşketinê ne, dive bê dîtin û gotin. Lê mixabin e ku, li Herêma Kurdistanê sûnetkirina keçan didome. Rewşa keç û jinan pê xirap dibe.

Dezgeha mafê mirovan ya navnetewî Wadi li ser pirsê çend roj berê zêdeyî 40 rûpelan, raporek belav kir (http://www.stopfgmkurdistan.org/study_fgm_iraqi_kurdistan_en.pdf). Navenda Wadiyê li Elmanyayê ye. Li gelek deverên Herêma Kurdistanê niwêneriyên wan hene û li wir bi pisporî xebata xwe didomînin.

Rapora Wadi bi giranî ji îstatîstîkan pêk tê. Sûnetkirina keçan û pêşketina pirsê li herêmê ji xwe re dike mijar. Rapor bi munasebata roja navnetewî ya li dijî sûnetkirina keçan hatiye amade kirin. Peyama Wadi di raporê de alarma xeterê dide raya giştî. Banga xwe digihêjîne gelê Kurdistanê û cîhanê. Felaketa li Herêma Kurdistanê ji ber sûnetkirinê hatiye sere keç û jinên Kurda, dihêne ber çavan:

“Li Herêma Kurdistanê bi giştî hejmarek mezin ji jin û keçan hatine sûnetkirin. Li hinek deveran hejmara jinên hatine sûnetkirin gihiştiye ji % 80 î. Li aliyê Hewlêrê ji % 63, li Silêmanî ji % 78 û Germiyan ji % 81 sûnet bûne.”

Me, weke dezgeha EuroKurd Human Rights-**EHR** berî nûha raporek li ser pirsê, bi hevkarîya Wadi û dezgehên navnetewî belav kiribû. Li dijî sûnetkirina keçan li Herêma Kurdistanê kampanyek mezin dabû destpêkirin. Rapora me wisa bû:

Rapora **EHR** bi inglîzî: <http://www.eurokurd.net/?do=publ> / Genital mutilation of Southern Kurdistan (Iraq)

Rapora **EHR** bi swêdî: <http://www.eurokurd.net/svenska.php?do=publ> / En rapport om: Könsstympning i Södra Kurdistan (Irak)

Rapora **EHR** bi kurdî: <http://www.eurokurd.net/kurdi.php?do=publ> / Rapor: Sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê

EHR li ser pirsgerêka sûnetkirina keçan li Herêma Kurdistanê mina Wadi hizir dike:

- Bûyer hetanî cihêkî bi perwerdekirina keçan ve girêdayî ye. Dema hejmara keçên xwendevan zêdetir dibe, sûnetkirina keçan nikare bi hêsanî pêk were. Keçên xwende, sûnetkirina xwe dikin cihê pirs û lêkolînan. Perwerdeya keçan li herêmê, adet, tore û baweriyên biyanî ku bûne bela sere civata me, napejirînin û gav bi gav ji herêmê dûr dixînin.

Divê mecalên perwerdê ji bo keç û jinan li herêmê zêdetir bibe.

- Pêlkirina mafê jinan li herêmê didome. Dîskrîmînekirin û hişkayiya li dijî jinê bûye beşek ji jiyane. Desthilatdariya mêran rê nade ku guhertin bibin. Guhertinên pêk tên û gavên tene avêtin bersiva civatê nadin û nikarin rê li ber şidetê bigirin. Pir giring e ku jin cihê xwe di rêvebiriya herêmê de bigirin. Organîzasyonên xwe û hevkarîya nav dezgehên xurtir bikin. Li dijî hişkayiyê dengê xwe bilind bikin.

- Unicef organa Yekîtiya Miletan e, berpirsiyarê pirsê li herêmê ye. WHO ji pirsê sihetê ya cihanê berpirsiyar e. WHO û Unicef li herêmê xebatên xwe didomînin. Lê li dijî sûnetkirina keçan li Herêma Kurdistanê gavên dihavêjin têr nake. Divê jibo guhertinê gavên cidî bavêjin.

EHR, bi berpirsiyarên WHO û Unicefê li herêmê û cihanê dê careke têkeve têkiliyê.

Em careke din dihenin zimên ku, dive Parlamento û Hikumeta Herêma Kurdistanê pirsê cidî bigire. Bi rêya qanûnî rê li ber sûnetkirina keçan bigire. Pîrejinên bi sûnetkirinê mûjil in bêne şiyarkirin. Mecalên perwerdê ji bo keçan zêdetir bikin. Zaniyariyê li ser pirsê di nava xelkê de û li dibistanan belav bikin.

Pir giring e ku, Serokê Herêma Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî û Serokomarê Iraqê birêz Celal Talebanî li ser pirsê gavên pêwîst bavêjin.

Kampanya me ya li dijî sûnetkirina keçan li Herêma Kurdistanê didome. Divê qirkirina li dijî hîsên jinan didome raweste. Pêwîst e ne tenê jin, mêrên Kurd jî dengê xwe li dijî sûnetkirina keçan li herêmê bilind bikin. Dezgehên têkildar yê netewî û navnetewî bêdeng nemînin.

EuroKurd Human Rights-EHR
Gabar Çiyan
Serokê Giştî